



Folkhälsomyndigheten

# Firotina bîraya gel (folköl)



# Naverok

- Firotina bîraya gel (folköl) 3
- Çi qaîde li ser firotina bîraya gel hene? 4
- Kî kontrol dike ka dikan li gorî qanûnê dimeşin? 8
- Kirîna kontrolê 9
- Eger mirov qanûna alkolê bînpê bike çî dibe? 10
- Çima qaîdeyên taybet ji bo alkolê hene? 11
- Rêberokeke kurt 12

## Firotina bîraya gel (folköl)

Ev broşûr ji bo kesên ku bîraya gel ango bi swêdi folkölê difiroşin an jî plan dikin ku bifiroşin hatiye amade kirin û li ser xalên girîng ên li ser firotina bîraya gel disekine. Bîraya gel vexwarineke bialkol e ku mîqdara alkola di nav de ya hacimî jî ji sedî 2,25 zêdetir e û ev heta jî sedî 3,5 kare derkeve, ango zêdeyî 2,25 heta 3,5.

Ji bo ku ber li zeraên ku alkol dide were girtin di qanûna li ser alkolê de hin biryar hene, û çendek jî wan li ser firotina bîraya gel in. Eger piştî ku te ev broşûr xwend alîkariya te bi agahî û desteka zêdetir hebe tu dikarî tîkiliyê bi şaredariya xwe re deynî.



# Çi qaîde li ser firotina bîraya gel hene?

## Serîlêdana firotina bîraya gel li şaredariyê

Li gorî qanûna li ser alkolê heta tu serî li şaredariya ku tu yê firotinê lê bikî nedî tu nikarî bîraya gel bifiroşî. Mecbûriyeta agahdarkirina şaredariyê heye da ku şaredarî karibe kontrol bike ka qanûn tê taqîb kirin, serdanên çavdêriyê li cihên firotinê bike û agahiya li ser qaîdeyên firotina bîraya gel bide.

Divê di serîlêdana li şaredariyê de agahiyên ku ji bo serdanên çavdêrikirin ango kontrolkirinê ji şaredariyê re lazim in hebin, hin ji van agahiyan bo mînak ev in; agahiyên fakta yên li ser cihê firotinê û weke xwediyê cihê firotinê agahiyên fakta yên li ser te. Eger xwediyê cihê firotinê were guhertin divê xwediyê nû serîlêdaneke nû ji şaredariyê re bişîne.

Tu dikarî formê serîlêdanê ji şaredariya xwe werbigirî. Şaredarî peyre serîlêdana te qeyd dike.

## Cih

Ji bo ku izna firotina bîraya gel were standin divê dikan li şaredariya ku dikan lê weke tesîsa xwarinê qeydkirî be. Di rewşên asayî de serîlêdana firotina xwarinê yan li komîsyona jîngeh û parastina tenduristiyê ya şaredariyê (kommunens miljö-och hälsoskyddsämnd) an jî li birêveberiya şaredariyê (förvaltning) tê kirin. Ji bo agahiyên li ser qonaxa serîlêdanê têkiliyê bi şaredariya xwe re deyne.

Ev ji bo kesên ku yê li restoranên xwe bîraya gel bifiroşin jî wiha ye; divê restoran qeydkirî be û ji bo firotina xwarinê ya daîmî musaît be.




## Firotina xwarinê

Divê dikan ji bo firotna xwarinê ya daîmî hatibe amade kirin, û divê tu tiştên xwarinê li dikana xwe bifiroşî. Firotna bîraya gel divê bi ser firotna tiştên xwarinê ve were kirin. Bo mînak têrê nake ku tu tenê şekirok, bestenî û kekan bifiroşî.

Ev tişt ji bo restoranan jî wiha ye. Eger mirov li restoraneke bîraya gel bifiroşe divê mirov li wir xwarinê jî bifiroşe. Eger izna te ya firotna alkolê hebe tu dikarî bîraya gel jî bifiroşî, ji ber ku tu jixwe bi vî awayî qaîdeyên izna servîskirina alkolê bi cih tîni.

## Kontrola xwe bi xwe

Kesên ku bîraya gel difiroşin mecbûr in firotna vê kontrol bikin ku jê re 'kontola xwe bi xwe' tê gotin. Li gorî kontrola xwe bi xwe divê tu programeka kontrola xwe bi xwe (egenkontrollprogram) çê bikî ku tê de dinivise ka ji bo tu û personelê te li gorî qaîdeyên qanûna alkolê kar bikin divê hûn çî bikin.



Programa kontrola xwe bi xwe ji bo te û personelê te weke destekekê ye, da ku tu weke xwediyê dikanê karibî garantî bikî ku qaîde têne bi cih anîn. Di programa kontrola xwe bi xwe de divê tu tedbîrên li dijî problemên ku dikarin di firotnê de derkevin distîni salox bidî. Girîng e ku program

- aktuel be
- ji aliyê personel ve hatibe fêhm kirin
- di karê rojane de bi dîqet li ser tê sekinandin.

Divê şaredarî karibe programa te ya kontrola xwe bi xwe kontrol bike. Loma baş e ku tu vê li cihê kar muhafaze bikî, da ku di serdanên çavdêrîkirinê de bi hesanî were bi dest xistin.

Eger tu kontrola xwe bi xwe nekî an jî programeke kontrola xwe bi xwe çê nekî şaredarî dikare firotna alkolê ji bo te qedexe bike yan jî îqaza bicihanîna kêmasiyê bide te.

Eger ji bo programa kontrola xwe bi xwe alîkarî ji te re lazim be tu dikarî têkiliyê bi şaredariya xwe re deynî. Tu dikarî mînakeke programa kontrola xwe bi xwe li ser malpera Folkhälsomyndighetenê bibîni, [www.folkhalsomyndigheten.se/tillsyn](http://www.folkhalsomyndigheten.se/tillsyn)

## Agahî û destekdana karkeran

Divê haya karkerên te jê hebe ka çî qaîdeyên firotna bîraya gel hene, weke xwediyê dikanê berpirsiyariya te li ser vê yekê heye. Divê tu herwiha personelê xwe li ser problemên ku dikarin di firotnê de derkevin jî agahdar bikî, bo mînak eger mişteriyek nexwaze nasnameya xwe nîşan bide. Girîng e ku bi taybetî personelê ciwan vê agahî û destekê bistîne. Bo mînak personelê bitecrûbe kare di dema kar de agahî û destekê bide yê ciwan.

Eger mirov bi awayekî binîzam bi personel re bi ser programa kontrola xwe bi xwe û qaîdeyên firotna bîraya gel re derbas bibe gelekî baş e. Herwiha divê personelê nû jî berî ku bîraya gel bifiroşe hîni agahî û qaîdeyên li ser firotnê bibe. Eger mirov dema agahdarkirina personel qeyd bike mirov dikare garantî bike ku haya hemû personelî ji rûtînen cihê firotnê û qaîdeyên firotnê heye. Girîng e ku mirov agahiyê bide personel ku eger ew li gorî qaîdeyên alkolê tevnegerin ji cezayê ku ew ê bixwin ew berpirsiyar in. Ji bo agahiya zêdetir li beşê bi navê "Eger mirov qanûna alkolê binpê bike çî dibe?" binêrin.

## Sînorê temen û kontrola temen

Qedexe ye ku mirov bîraya gel bifiroşe kesekî ku 18 sal nedagirtine. Divê personelê kasayê emîn be ku mişterî ev temen dagirtiye, ev berpirsiyariya wan e. Eger personelê kasayê tê

nederxe ka mişterî çend salî ye divê ew li nasnameya mişterî binêre.

Eger mişterî nikaribe nasnameya xwe nîşan bide personelê kasayê nikare bîraya gel bifiroşe mişterî.

Dibe ku zehmet be mirov tê derxe ka kesekî ciwan çend salî ye.

Gelek dikan ji bo vê kêşeyê ji holê rakin daxwaza lênêrina nasnameyê ji hemû kesên ku ji 25 salan ciwan dixuyin dikin.

Tu dikarî lewheyên binivîs ên biçûk, dekal ango etiket, bi dikanê ve bikî da ku haya mişteriyên ji sînorê temen ê firotina bîraya gel hebe.

Van lewheyên bi kasayê, bi refê bîraya gel û bi deriyê dikanê ve daleqîne. Ev herwiha alîkariya personelê te ji dike.

Tu dikarî van lewheyên binivîs ên bi agahiya sînorê temen li ser malpera Folkhälsomyndigheten sipariş bikî, [www.folkhalsomyndigheten.se](http://www.folkhalsomyndigheten.se).

## Qedexeya firotinê di rewşên gumana firotina qaçax de

Eger guman hebe ku kesê bîraya gel dikire dê vê bide kesekî ji 18 salan biçûktir firotin qedexe dibe. Divê ev risk ji aliyê personelê kasayê ve di rewşên taybet ên wiha de li ber çav were girtin û nirxandin. Girîng e ku di rewşên wiha de haya mirov jê hebe ka ciwan li ber deriyê dikanê kom dibin. Wê demê risk heye ku kesê temen dagirtî bîraya gel dikire û dide kesên ji 18 salan biçûktir.

Gelek caran tê dîtin ku ciwanên ji 18 salan biçûktir alkolê ji kesên ji 18 salan mezintir digirin. Lêkolîn nîşan didin ku kesên ku alkolê ji ciwanên temenbiçûk re dikirin pirê caran hevalê kurik, hevala keçik, hevalek an jî xwîşk û birayên ku temenê wan mezin in.


## Qedexeya firotinê ji bo kesên ku bi awayekî berbiçav di bin tesîra alkolê de ne

Qedexe ye mirov bîraya gel bifiroşe yan jî bide kesên ku bi awayekê berbiçav di bin tesîra alkolê an jî madeyeke din a serxweşker de ne.

## Pêşkêşkirina bo bazarê û reklam

Di hemû pêşkêşkirin û reklamên alkolê yên ji bo mişteriyên de şerta bisînorbûnê heye. Ev tê wê maneyê ku pêşkêşkirin û reklama bîraya gel nikare zorlêker an jî dilkêş be, û divê ev mirovan teşwîqî vexwarina bîraya gel neke. Divê di her rewşeke taybet de were nirxandin ka çi weke zorlêker, dilkêş an jî teşwîqker tê dîtin. Konsumentverketê şîretên raya giştî dane hev da ku bi rêkûpêk diyar bike ka şerta bisînorbûnê çi ye. Yek ji van ew e ku divê pêşkêşkirin ji bo ku bi taybetî balê bikişîne ser bîraya gel an jî vexwarina wê teşwîq bike nehatibe amade kirin. Divê ev herwiha weke beşekî serdest ê jîngehê ji neye amade kirin, bo mînak divê gel bi awayekî mezin marûzî reklam û pêşkêşkirina vexwarina bialkol nemînin. Mirov nikare di reklamên vexwarinê bialkol de zarok û ciwanên ji 25 salan biçûktir bi kar bîne û reklam nikare berê xwe bide zarok û ciwanên ji 25 salan biçûktir.

Pêşkêşkirin û reklamkirina bîraya gel dikare tenê li cihê firotinê yan jî bi vê minasebetê were kirin. Eger şerta bisînorbûnê ya di qanûna alkolê de bi cih bîne izn heye ku mirov lewhayekê bi devê dikanê ve monte bike yan jî vê bi çend metreyan dûrî deriyê dikanê deyne





## Qedexekirina îkramkirina bîraya gel

Qedexe ye ku ji bo firotin zêde bibe yan jî navê vexwarinê belav bibe, ango bi armanca reklamkirinê vexwarinên bialkol werine îkram kirin. Ango kesên ku bîraya gel difiroşin nikarin vê îkram bikin.

Agahiya zêdetir li ser malpera Konsumentverketê heye, [www.konsumentverket.se](http://www.konsumentverket.se).

## Baca berhemên bialkol

Berhemên bialkol li gorî qanûna (1994:1564) ya li ser baca alkolê têne bac kirin. Ji bo agahiya zêdetir a li ser vê hejmarê telefonî Daîreya Bacê, Skatteverketê bike, 010-578 71 99, an jî li malpera wan binêre [www.skatteverket.se](http://www.skatteverket.se).

# Kî kontrol dike ka dikan li gorî qanûnê dimeşin?

## Çavdêrî

Şaredarî û Daîreya Polisan daîreyên çavdêrîkirina qaîdeyên firotina bîraya gel in. Ev tê wê maneyê ku herdu daîre çavdêriyê pêk tînin û kontrol dikin ka firotin qaîdeyên qanûna alkolê binpê dikin.

Wezîfeya sereke ya polis ew e ku dema sûc pêk tê midaxele bike. Wezîfeya şaredariyê zêdetir li ser berlêgirtina binpêkirina qaîdeyan e. Şaredarî dikanê kontrol dike û eger kêmasî hebin îqaz û mieyideyên îdarî bi kar tîne da ku dikan qaîdeyan bi cih bîne. Şaredarî herwiha alîkarî û agahiya li ser firotina bîraya gel jî dide. Ji bo agahiya zêdetir li sernivîsa “Mieyideyên îdarî” binêre.

Ji bo ku karê çavdêrîkirinê were finanse kirin şaredarî dikare xerca çavdêrîkirinê bistîne. Şaredarî bi xwe biryarê dide ka xwediyê dikanê yê çiqasî ji bo xerca çavdêrîkirinê bide.

Dema şaredarî û polis serdanên çavdêrîkirinê dikin heqê wan heye ew bikevîne cih û avahiyên firotinê. Herwiha heqê wan heye daxwaza zanyarî, ewraq û tiştên wiha bikin û li wan binêrin ku ji bo karê çavdêrîkirinê lazim in.

Herwiha hin daîreyên din ên çavdêrîkirinê jî hene ku kontrol dikin ka qaîdeyên qanûna alkolê tene taqîb kirin an na; Länsstyrelsen ango birêveberiya parêzgehê daîreya herêmî ya çavdêrîkirinê ye û Folkhälsomyndigheten ya neteweyî ya çavdêrîkirinê ye.

Konsumentverket qaîdeyên li ser pêşkêşkirin û reklamkirina vexwarinên bialkol kontrol dike. Eger reklamkirin li dijî qaîdeyên qanûna alkolê be, qanûna reklamkirinê (marknadsföringslagen (2008:486)) tê bi kar anîn. Li gorî vê qanûnê Konsumentverket dikare hin pêşkêşkirin û reklamkirinên şirketê qedexe bike, sûc weke



cezayê pereyî tê guhertin. Konsumentverket herwiha ji bo şeweyê pêşkêşkirin û reklamkirina şirketê qedexe bike dikare serî li dadgehê bide.

Eger mirov li gorî biryara daîreyeke çavdêrîkirinê tevnegere mirov cezayekî pereyî dide. Biryara cezayê pereyî ji aliyê dadgehekê ve tê dan. Mîqdar dikare ji serî ve were diyar kirin û heye bi hezaran kron be.



## Kirîna kontrolê

Ji bo ku were dîtîn ka rûtînên baş ên kontrola temen li cihê firotinê hene şaredarî dikare kirîna ji bo kontrolê bike. Ev tê wê wateyê ku kesekî ku ciwan xuya dike diceribîne ka ew dikare bêyî ku nasnameya xwe nîşan bide bîraya gel bikire yan na.

### Kirîna kontrolê çawa tê kirin?

Şaredarî kesekî ku 18 sal dagirtiye ji bo pêkanîna kirîna kontrolê digire. Ji bo ku metod efektîv be tu xebera xwediyê dikanê pê nayê xistin. Dîsa jî girîng e kesên ku firotina perakende dikin zanibin ku şaredarî dikare kirîna kontrolê bike. Divê xwediyê dikanê personelê xwe li ser kirîna kontrolê agahdar bike da ku personel sedema kirîna kontrolê zanibe.

Piştî kirîna kontrolê kesê ku li şaredariyê li ser vê mijarê dixebite tê û xwediyê dikanê li ser encamê agahdar dike. Bi vî awayî şaredarî jî dikare garantî bike ka te û personelê te qaîdeyên mijarê û sedema sînorê temen fêm kiriye yan na.

Şaredarî nikare encama kirîna kontrolê ji bo mieyideyên îdarî weke bingeh bi kar bîne. Ev tê wê maneyê ku tu weke xwediyê dikanê ji ber encama kirîna kontrolê îqazê nastîni yan jî bi qedexekirina firotinê re rû bi rû namîni. Lê kirîna kontrolê dikare ji bo baştirkirina rûtînên sînorê temen alikariya xwediyê dikanê bike. Şaredarî di karê baştirkirinê de destekê dide.



# Eger mirov qanûna alkolê binpê bike çi dibe?

Du îmkânên mieyideyan di qanûna alkolê de hene. Di ya yekem de polis û dozger dikarin mieyideyên cezayî ji bo sûcê bi kar binin. Sûc dikare wiha were bi nav kirin, firotina alkolê ya bêzn, xwedîbûna alkolê ya bêzn û îdarekirina vexwarinan a bêzn. Mirov dikare hem cezayê pereyî hem jî yê girtîgehê ji ber van sûcan bistîne. Di rewşa duyem de şaredarî dikare ji bo ku guhertineke baş pêk bîne mieyideyên îdarî bikar bîne. Bo mînak eger xwediyê dikanê programeke kontrola xwe bi xwe çê nekiribe yan jî bîraya gel firotibe kesekî ji 18 salan biçûktir mieyideyên îdarî dikarin werine bi kar anîn.

## Mieyideyên cezayî

Di qanûna alkolê de berpirsiyariya şexsî heye û ev tê wê wateyê ku tu û personelê te hûn dikarin cezayê pereyî bixwin an jî heta 6 mehan bi girtîgehê werine ceza kirin.

Ji bo xalên li xwarê ceza tê dan

- Eger tu bîraya gel bifiroşî kesekî ji 18 salan biçûktir
- Eger tu bîraya gel bifiroşî kesekî ku bi awayekî berbiçav di bin tesîra alkolê yan jî madeyeke din a serxweşker de ye.

Tu weke xwediyê dikanê dikarî werî ceza kirin

- eger tu bêyî ku iznê ji şaredariyê bistîni bîraya gel bifiroşî
- eger tu bi qasî ku şaredariyê qedexe kiriye dîsa jî bîraya gel bifiroşî.
- Eger bi qasî ku dikana te şertên firotina bîraya gel bi cih nayêne (bo mînak eger li dikana te tiştên xwarinê neyêne firotin) dîsa jî diyar be ku li dikana te ji bo firotinê bîraya gel heye.

## Mieyideyên îdarî

Ji xeynî cezayê pereyî û yê girtîgehê herwiha mieyideyên îdarî jî hene. Eger firotina bîraya gel bibe sedema bênîzamîbûn û serxweşiyê, an jî eger qaîdeyên qanûna alkolê neyêne taqîb kirin şaredarî dikare firotina bîraya gel li dikana te qedexe bike. Eger li gorî nirxandina şaredariyê qedexekirin giran be, ew dikarin li şûna vê îqazê bidin da ku nîşan bidin ku binpêkirina qaîdeyan gelekî cidî ye. Di rewşên binpêkirina qaîdeyên qanûna alkolê de qedexekirina firotinê 6, an jî di rewşên cidî û dubarekirî de 12 meh in.

Tu dikarî ji bo biryarên mieyideyên îdarî îtiraza xwe pêşkêşî dadgeha îdarî ya giştî (allmän förvaltningsdomstol)bikî.

# Çima qaîdeyên taybet ji bo alkolê hene?

## Alkol tesîrê li tenduristiyê dike

Ji bo ku mirov ji zerarên alkolê yê bişîşkî û civakî werine parastin û ji bo bikaranîna alkolê bi giştî kêmtir bibê li Swêdê siyaset û qanûnên li ser alkolê bêrlêgir û bîsînorker in. Ev rê ji bo tenduristiya gel baştir bibe hatiye hilbijartin. Bi tedbîrên weke monopolkirina firotina perakende ya alkolê (Systembolaget), sînorê temen û baca serfêkirinê ya bilind hewl tê dan da ku bidestxistina alkolê were bi sînor kirin.

Gelek sedemên zerara alkolê hene. Tesîra bilez a li ser mejî (serxweşî) bingehe gelek zerarên rasterast ên fizîkî pêk tîne, ku bo mînak şidet, xeniqîn, agirdadan, ketin û qezayên trafikê hin ji wan in. Alkol herwiha ji bo tevnên laş û organan bijehr e û dikare bibe sedema gelek nexweşiyên cuda. Heta pê vexwarina kêmtir a alkolê di demeke dirêj de dikare bo mînak bibe sedema nexweşiyên weke tansiyona bilind û nexweşiyên kronîk ên kezabê. Tesîreke tiryakker a alkolê heye, ku dikare bibe sedema problemên civakî.

Mesrefa zerarên alkolê ji bo gelê Swêdê salane nêzîkî 45 milyar kron e. Bikaranîna alkolê yek ji rîskên herî mezin ên tenduristiyê ye, lê mirov dikare vê rewşê biguhere.

## Faktayên li ser alkolê

- Pirê caran hevalek, xwîş û bira yan jî xwîşk û birayên hevalan ji kesên temenbiçûk re bîraya gel dikirin.
- Kesên ku dêûbavên wan alkolê didine wan li derveyî malê ji kesên din zêdetir alkolê bi kar tînin
- Ciwan li dijî rîskên alkolê ji temenmezinan meyildartir in û dema ew di bin tesîra alkolê de ne rîska şidet û zerarê ya li ser wan bi xwe û li ser kesên din zêdetir e.

- Bikaranîna alkolê dibe sedema zêdebûna zêdeyî 200 nexweşî û zeraran.
- Nexweşiyên ku herî zêde tene dîtin nexweşên rehên koronerê, kansera pankreasê, kezaba bibez û sîroza kezabê ne.

## Çima sînorê temen heye?

Mejî heta 25 saliyê mezin dibe. Ev dike ku mejiyê ciwanan ji yê mezinan hesastir dibe, û mirov çiqasî zû dest bi vexwarinê bike rîska teryakbûnê jî ew qasî mezin dibe. Mezinahiya bedenê jî di vê mijarê de girîng e. Di bedeneke biçûk de ava ku alkol dikare tevli bibe kêmtir e, û ev dike ku ev kes zûtir serxweş dibin.

Rîska zerarên acil ên ji ber bikaranîna alkolê bi taybetî li cem ciwanan zedetir e. Ev hem ji bo zerarên acil ên weke jehrîbûna alkolê hem jî ji bo qeza û lêdanên ji ber alkolê wiha ye. Ciwan li dijî rîskên alkolê ji mezinan meyildartir in; ew dixwazin tiştên nû biceribînin û bimeraqtir in. Di temenê wan de ev merqadarî normal e. Lê eger ew serxweş bibin kirina tiştên birîsk jî li cem wan zêde dibe. Hingî ew hesantir dikevina nav şer an jî rewşên bitehlûke ku dikare hem zerarê bide wan bi xwe hem jî kesên derdora wan.

# Rêberokeke kurt

## Ji bo xwediyê dikanê

- Bîraya gel vexwarineke bialkol e.
- Divê tu ji bo firotina alkolê iznê bistinî. Tu serîlêdanê pêşkêşî şaredariya ku firotinê lê were kirin dikî.
- Tu yê programeke kontrola xwe bi xwe çê bikî.
- Tu yê personelê xwe li ser qaîdeyên firotina bîraya gel agahdar bikî.
- Tu nikarî reklamên zorlêker û dilkêş ên bîraya gel li cihê firotinê bikî yan jî tu nikarî kesî ji bo vexwarina bîraya gel teşwîq bikî.
- Ji bîr neke, ji personelê xwe re bêje ku şaredarî dikare kirîna kontrolê bike.

## Ji bo personelê kasayê

- Tu nikarî bîraya gel bifiroşî yan jî bidî kesekî ji 18 salan biçûktir.
- Eger tu temenê mişterî tê dernexî divê tu tim daxwaza nasnameyê bikî.
- Tu nikarî bîraya gel bifiroşî yan jî bidî kesekî ji 18 salan biçûktir.
- Tu nikarî bîraya gel bifiroşî yan jî bidî kesekî ku bi awayekî berbiçav di bin tesîra alkol an jî madeyeke din a serxweşker de ye.
- Tu nikarî bîraya gel bifiroşî yan jî bidî kesên ku tu guman dikî dê vê bidine kesên ji 18 salan biçûktir (langning).
- Eger tu bîraya gel bifiroşî kesên ji 18 salan biçûktir an jî yên ku bi awayekî berbiçav di bin tesîrê de ne heye tu ji ber vê ceza bixwî.

## Di kontrola xwe bi xwe de hay ji van hebe

- Perwerdehî û agahî: Personel kengî û çawa tê agahdar kirin?
- Agahdariya ji bo mişteriyên: Mişterî di derbarê sînorê temen de çawa têne agahdar kirin?



- Rûtînen kasayê: Ji bo ku firotina bîraya gel a bo kesên ji 18 salan biçûktir were sekinandin çî rûtîn têne bi cih anîn.
- Li dijî kesên ku alkolê ji kesên temenbiçûk re dikirin (langning) çawa tê xebitîn? Personelê ciwan desteka taybet distîne?
- Tedbîr: Eger firotin li gorî qaîdeyan neyê meşandin çî tedbîrên navxweyî têne girtin?
- Qeydkirin: Kontrola xwe bi xwe çawa tê qeyd kirin, ango rûtîn, kêliyên perwerdehiyê û tiştên weke van?

Divê tu zanibî ku ji bo personelê ciwan heye zehmet be qaîdeya sînorê temen ji bo hevsalên xwe bi cih bînin. Loma baş e eger kesekî mezintir ê bitecrûbe tim weke destek hazir be.

## Ji bo personelê kasayê hin şîretên pratîk

- Eger tu temenê mişterî tê dernexî tim daxwaza nasnameyê bike. Dema kesekî ku ji 25 salan biçûktir xuya dike dixwaze bîraya gel bikire daxwaze nasnameyê bike. Zanibe ku kesên ji 18 salan mezintir jixwe pirê caran li dijî daxwaza nişandana nasnameyê nasekinin. Eger mişterî ji 18 salan biçûktir xuya bike û nikaribe nasnameya xwe nişan bide jê re bêje ku tu nikarî bîraya gel bifiroşî wî yan jî wê.
- Haya te ji kartê ajotinê yê ji bo mopedan hebe. Ev weke kartê ajotinê yên ji bo otomobîlan xuya dike, lê heye xwediyê kart ji 18 salan biçûktir be. Li ser kartê ajotinê yê mopedan îşareta AM heye û li jêra kart jî wêneyê mopedekî hatiye xêz kirin.
- Eger gumana te hebe ku firotin li dijî qaî-deyên qanûna alkolê ye tu dikarî firotinê betal bikî. Ji mişterî re bêje ku eger tu qanûna alkolê binpê bikî tu bi rîska cezayê pereyî yan jî yê girtîgehê te rû bi rû dimîni.

- Gumana te heye ku kesê temenmezî dê bîraya gel bikire û bide kesekî ji 18 salan biçûktir? Ji mişterî re bêje ku divê tu vê yekê bipirsî. Eger bersiv te îqna neke bîraya gel nefiroşe vî kesî.
- Bila haya te jê hebe ka ciwan li ber dikanê kom dibin. Wê demê rîsk heye ku kesekî mezî bîraya gel dikire û dide kesên ji 18 salan biçûktir. Eger tu guman bikî ku ev ê biqewime divê tu bîraya gel nefiroşî vî kesî.
- Kesekî ku nikare bîraya gel bikire dikare nîqaşan bike yan jî esebî bibe. Divê wê demê tu bi xwe aram bî. Peyama xwe bi zelalî eşkere bike û jê re bêje ku nîqaşên ku ew dike beredayî ne, ango tu alîkariyê nakin. Eger munkin be ji şefê xwe yan jî hevkarê xwe alîkariyê bistîne.
- Eger mişteriyek tiştekî neqanûnî bike baş lê binêre û dema hertişt qediya van binivîse. Heye tu weke şahid lazîm bî. Eger pêwîst be telefonî polîs bike. Bûyerê ji şefê xwe re bêje.

Eger alîkariya te bi şîret û rêberiya zêdetir hebe têkiliyê bi şaredariya xwe re deyne!



**KONTROLA NASNAMEYÊ.** Haya te jê hebe ku kartê ajotinê yê ji bo mopedan weke yê erebeyên normal e, lê heye xwediyê kartê mopedê ji 18 salan biçûktir be.



**Tu dikarî bizanî ka kî 18 sal dagirtine? Helbet zehmet e mirov tenê ji şekilê kesekî derxe ka ew çend salî ye?**

BERSIV: Rêza jor ji çepê ber bi rastê: 18 sal, 17 sal, 17 sal, 21 sal, 17 sal, 17 sal, Rêza jêr: 17 sal, 18 sal, 15 sal, 18 sal.



Ev broşûr ji bo kesên ku bîraya gel difiroşin an jî dixwazin dest bi bifirotinê bikin hatiye amade kirin. Tu dikarî di vê broşûrê de agahiyên li ser qanûna alkolê bixwînî û bibînî ka çi qaîde ji bo firotina bîraya gel hene û di bicihanîna van qaîdeyan de berpirsiyarî ya kê ye. Di dawiyê de şîret û agahdariyên pratîk ên li ser kontrola xwe bi xwe û firotina bîraya gel hene.

Folkhälsomyndighetenê ev agahî bi alîkariya nûnerên şaredarî, birêveberiyên parêzgehan, Konsumentverket (Daîreya Serfkaran) û Skatteverketê (Daîreya Bacê) amade kiriye.



**Folkhälsomyndigheten**

Solna Nobels väg 18, 171 82 Solna Östersund Forskarens väg 3, 831 40 Östersund.  
[www.folkhalsomyndigheten.se](http://www.folkhalsomyndigheten.se)